Destura Sîwana mal û komelên êzîdiya - pêshniyar

Pêshgotin

§ 1 Nav, Cih û sala kar û xebatê

§ 2 Armancê sîwanê

§ 3 Endametî, destgirtin û wendakirina endametiyê

§ 4 Maf û erqê endama

§ 5 Organê sîwanê

§ 6 Hatin û mesrefê sîwanê

§ 7 Betalkirina sîwanê

§ 8 Destnîshanên dawî

§ 9 Bihêzgirtina destûrê

Pêshgotin

Sîwan li himberî raya gishtî, siyaset û îdarê berjewendiyê komel û malê êzidiya li almanya mesûle.

Ewê hewl bide ji bo komel û malê êzîdiya di dema niha de û di pêsherojê de karîbin karê xwe wek pêwiste bimeshînin û xwe bighînin armancê xwe.

Organ û endamê sîwanê

a. Hemfikirin kû ew xizmeta civaka êzidiya li almanya bikin, diyalogê bi olê din re xwedî bikin û pêshde bibin û her dem ew xizmetê ji bo xêra civaka xwe bikin.
b. Hemfikirin kû ewê tenê li ser bingeha ilmê êzîtayê, yekcar li ser bingeha sed û hedê de di nava charcova qanunê almanya federal de tev bigerin.
c. Hemfikirin kû sîwan wê di siyaseta partiya de bê alî be.
d. Ewê li gorî esas û prenzîpên êzîdiya nerx bidin hevalbendiyê, rêzgirtinê, lêborinê, dîtina berfireh û pishtgirtina însana.
e. Ew banga zodarîyê û kotekê bi her rengî red dikin,
f. Ew esasê wekhevgirtinê (bê ferq û mêlî) di nava endama de û zelalî li himberi kesên derve û yên xerîb li ber cav digirin.

§ 1 Nav, cîh, sala kar

1. Navê komelê „Sîwana federal a mal û komelên êzîdiya li almanya“ (Navê qut: SMKEA). Divê ew li qeyda komela li dadgeha bielefeld were qeyd kirin û e.V. li nav were zêde kirin. Sîwana federal sîwana êzîdiyên li almanya dijîn û a mal û komelên wane.

2. Cihê sîwana federal bajarê bielefelde. Lê kar û barê wê ne li cihê wê bi sînor kiriye. Sîwana federal dikare proja û chalakiya tevlî saziyê dewletî û ne dewletî bikar bîne.

3. Sala kar û xebatê destpêka salê heya dawiya salê ye.

§ 2 Armancên sîwana federal

1. Sîwan ne li ser feyda shexsî kar dike, ew karê feyda aborî ji bo xwe nade pêsh. Ew tenê kar û xebatê ji bo xizmeta raya gishtî li gorî armancên hêjane barsivikayia pacê bistînin yên destûra pacdayînê dike.

2. Pere û tishtên sîwanê dikarin tenê ji bona armancên di desturê de hatine kiwshkirin werin mesrefkirin. Destûr rê nade kû, malê sîwanê mesref ji bo armancên xerîb anjî ji edetê dûr bikin û heqê shehsxa zêdî heqê wan bidin. Dema endamek bixwaze sîwanê terk bike anjî sîwan were betal kirin, mafê tû endamî li ser malê sîwanê nîne.

3. Armanca sîwanê parastin û pêshvebirina êzîtayê ye. Sîwan organeke calakî a mal û komelên êzdiya û yên pêve giradiyî ye. Ew li ser hemû mijaren êzîdiya aleqedar û mijul dibe. Ew bingeha agahdarî û danûstandinê her dem ji bona armanc û berjewendiyên raya gishtî û yên ezidiya pêshkêsh dike. Esasê karê Sîwanê evê li jêr bi rêz kirîne:

    a) Xizmet li gora riya olî, erf û edetên êzîdiyatiyê ji bona êzidiyan û êzîdiyatiyê re bikê;
    b) Xizmet ji bona yekitî û tifaqiya êzîdiyan;
    c) Alikarî ji bona lêkolîna li ser ezîtayê.
    d) Qebûlkirina ola êzîdiyan wek saziyêke qanûnî a mafê gishtî.
    e) Parastina ol, chand û sembolê ola êzîdiyan;
    f) Qebûlkirina fermanên qirkirinê, yên li ser êzîdiyan hatîne meshandin;
    g) Alîkariya mexdûrên êzîdî;
    h) Avakirina dezgehekî navendî a ragihandinê;
    i) Avakirina beshêkî dezgehê ji bo lêkolînê li ser êzîdiyatiyê (nimûne, ji bo komkirin û nîzamkirinek systematik a qewl, beyt û qesîdên êzîdiyan);
    j) Qedirgirtin/Rêzgirtin ji bo dûnavên êzîdiyan;
    k) Alikar kirina avakirina meclisekê dûnavên êzîdiyan;
    l) Tevde nexshkirina pêvajoya transformationa êzîdayê li diaspora
    m) Qewînkirina tevna ezîdiya a hindûrî.
    n) Alîkariya entegrasiyona êzîdiya li elmanya
    o) Alikariya avakirina shingalê;
    p) Rêzgirina xweseriya mal û komelên êzîdiyan
    q) Qebûlkirina rojên pîroz yên êzîdiyan;
    r) Xizmet ji bo parastina milk û malên êzîdiyan û cihên pîroz yên êzîdiyan li welat;
    s) Xizmet ji bo destgirtina mafên êzîdiya, yên siyasî li welat;
    t) Xizmet ji bo pêshkêshkirina dersên ola êzîdiyan li dibistanan;
    u) Xizmet ji bo avakirina navenda lêkolîna ilmê êzdayî;
    v) Pishtigirtina daxwaza wekheviya jin û mêran;

w) Pêjirandina biryarên civaka rûhanî;
x) Pishtgirtina daxwaza pîrozkirina îda bi tevayî li mal û komelan.

4. Armancên Destûrê bi taybetî wiha tên bi cîh anîn:
   a) Hishyarî di derheqê mijarê tevayî yên endamê sîwanê de, yekcarî bi hevkariya îdara gishtî, rêkxistîn û hemû cih û warên ji biona karê sîwane giringin.
   b) Chapkirina nivîsa li ser dane nasîna dirust a ezdayetiyê;
   c) Sazkirin û xwedîkirina pirtûkxanekê;
   d) Pishtgirtina nivisandina nivîsên zanistî û lêkolînvanî;
   e) Dayina rûmetê ji bo shexsîyet û saziyên ji bona ezdayetiyê xizmetek balkêsh kirine;
   f) Bersivdana pirsên mafên hevbesh wek berpirsiyarê doza ezîdiya li himberî saziyên dewletî û yên ne dewletî yên aleqedar.
   g) Amedekirina nivîsên agahdarî û dersên ola ezîdiya ji bo dibistanê dewletê û yên alî;
   h) Hewldan ji bo qebulkirina dersên ola êzî li dibistanên dewletê li elmanya û sazkirina enstîtuta ezdayetiyê li zanîngeheke dewletê.
   i) Perwerdekirina qewlbêja û mamosteyên ola êzî, ji bona xizmeta olî li mal û komelan. Beshek ji vê xizmetê fêrkirina rê û rismê ezdayetiyê yên bingehînin ji bona picuk û mezina ye û rêkxistinkirina seminer, civîn û xwendina tekstên olî û rêkxistina xizmeta rûhanî di demên mirinê de.
   j) Pishtgirtin û koordinekirina calakiyên civakî yên endamê sîwanê
   k) Koordînekirin û pishtgirtina karê entegrasyonê yên endamê sîwanê. Dema pêwîstî pê hebe, sîwan karê îdarî digire ser xwe.
   l) Pishtgirtina avakrin û xwedî kirina malên olî û candî
   m) Pishtgirtina xizmeta ji bo civana, mezina û jina a endamê sîwanê. Sîwan ji bo perwedekirina endamê xwe rêwanberiya perwerdî koordine dike. Dema pêwistî pê hebe, ewê serkêshî ji bona avakirina malên kal û pira bike. Ji bona civana îmkanê derbaskirina wextê vale, semînerên dawiya hefteyê, imkanên shewrdariya pirsên dibistanî, pîsheyî, siyaseta civakî pêshkêsh bike. Piraniya karê shwerdariyê û perwerdê wê ji aliyê kesên sozialpädagokên pîshe ve were kirin;
   n) Pishtgirtina ezidiyan ji bo cûna hecê. Dema pêwisti pê hebe, sîwan wê bixwe cuyînên hecê organize bike.
   o) Pishtigirtina karê perwerdekirinê yên endamê sîwanê bi koordînekirina kursên êntegrayonê, yên ziman, yên elimandina xwendin û nivisê, alîkariya dersên malê, semînara û konferenza, chêkirina shahiyên chandî û musîkê.
   p) Rêkxistina hevrikiya xwendina tekstên olî û yên rê û rismê êzdayetiyê;
   q) Rêkxistina kursên govendê, stranbêjîyê û enstrumentê musîkê li mal û komelên êzîdiya;
   r) Pêshkêshkirina îmkanên perwerdekirina xwedîkirina zaroka, îmkanên shewrdarî ji bo pirsgirêkên malbata, pirsên tiryakî û tendurustî ji bona endamê sîwanê. Karê shêwrdarî û alîkarî tenê ji aliyên kesên ji bo vî karî perwerdekirî ve tên dayin.
   s) Destgirtina karê chapemeniyê û raya gishtî a derveyî heremê bi derxistina kovarakê sîwanê, chêkirina tishtên agahdari (îlan, poster, broshur, belavok, dawetnama, salnama, sertîfikata uhw.), chekirin û xwedîkirina malperên internetê, filîmê nasînê û CD yên pezndanê.

5. Sîwan dikare tevlî endamê xwe bibe xwediyê saziyên hevbesh.

6. Sîwan hewl nade bandorê li kar û barê endama yên hindurî bike. Xweseriya endama bi her awahî wê were parastin.

7. Sîwan dikara saziyên eyaleta saz bike. Ji bo vî karî biryara civina delega pêwiste.

8. Sîwan wê hewl bide bi hemû saziyên ezîdiyan re li cihanê kar bike.

§ 3 Endametî, destgirtin û wendakirina endametiyê

1. Ji bo endametiyê her kes/sazî azade, destgirina endametiyê bi daxwaznamê pêk te.

2. Her mal, komel û rêkxistinen êzîdiya (wekf), yên qeyd kirî, yên bi rêk û pêk, yên pishtgiriya armancên destûrê dikin, dikarin endametiyê destbigrin. Ew mal, komel û saziyê li kêleka endamê ezîdî, endamên wan yên ne êzîdî jî, yên bi rek û pêk hebin, dikarin endametiya sîwanê bigrin.

3. Endamê sîwanê ew endamên sazkirina sîwanê ne, yên navê wan di lîsta dawiya destûrê de hatiye birêzkirinin.

4. Birêvebirî di derheqê daxwaznameya endametiyê de biryar dide. Dema daxwazname hate red kirin, mafê daxwazkar heye di nava shesh heftiya de îtiraz bike. Birêvebirî di derheqê îtirazê de biryar dide. Eger biryara birêvebiriyê ne bi yekdengî be, endametî radiweste. Civîna delega pishtre bi piraniya dengê dayî di derheqê daxwaznamê de biryar dide.

5. Endemetî bi shandina erêkirina endametiyê dest pê dike.

6. Xweseriya mal û komelên endamên sîwanê bi endametiya sîwanê li herêma xwe nakeve tû astenga.

7. Ew mal, komel û sazîyên li elmanya ne endamê sîwaneke êzîdiya bin, xwediyê mafê endametiyê ne. Dema bahsa sîwanê tê kirin, bahsa bi kêmasî dû komel an jî malê xweser li 2 eyaleta tê kirin, yên îtifak kirine.
   a) Eger di dema pêshkêsh kirina daxwaznameya endametiyê de berdendam endamê sîwaneke êzîdiya li almanya be, ew xwe girêdide endametiya xwe li wê sîwanê bi destgirtina endametiyê rawestîne. Ji derveyî vêna, karê wê sîwanê bixwe divê were rawestandin eger armanc û karê wê dijî armanc û karê sîwanê be. Pishtî demeke salekê divê ew sîwana rikber were betal kirin. Eger ev pêk neyê, divê endam endametiya xwe di wê sîwanê de betal bike.
   b) Pishtî endematî di sîwanê de qebûl bû, destûr nîne ew endamê sîwanê din bimîne.

8. Endametî tê dawiyê bi:
   a) Daxwaza terk kirina endametiya sîwanê mehekê berî derbasûna salê bi niviskî ji birêveriye re tê shandin. Daxwaza terkê divê berê ji aliyê birevebiriya malê an jî komelê ve an jî di civîna endama de bi piranî wek biryar hatibe standin.

b) Endametî dikare were wenda kirin dema endam erkê xwe yên endametiyê bi cih neyne, an jî dijî armancên sîwanê kar bike, an jî shertên endametiyê li gorî §3 a destûrê neyne cih. Sebekî din ji bona wenda kirina endemetiyê ewe kû, endam pishtî dû cara hate hishyar kirin û ewî dîsa jî endametiya xwe a 12 meha neda. Biryara wenda kirina endematiyê ji aliyê birêvebiriyê ve tê standin. Pishti 6 heftiya kû biryar kete destê endam, mafê wî heye kû ew bi niviskî di namake li postê qeydkirî biryara hatî dayîn îtriraz bike. Îtraz biryarê pash de dide. Civîna delega bi piraniya denga hatî dayîn di derheqê îtrazê de biryar dide. Mafên endam heye dirustbûna biryara hatî dayin ji aliyê dadgeha fermî ve bide bercav kirin. Bangkirina dadgeha fermî biryara hatî dayin pash ve dide heya biryara ddgeha fermi têkeve meshandinê.

§ 4 Maf û erkên endama

1. Mafên endama heye daxwaza alikarî, shêwrdarî û pishtgiriyê di carcova armancên sîwanê de bikin.

2. Her endamê komel an jî maleke endam dikare ji bo saziyê sîwanê were hilbijartin.

3. Her endam dikare jimarek delege, yên jimara wan di destûre de hatiye kuvshkirin wek mesûl / berpirsyar bishîne civîna delega. Navê delega û cîhgirê wan divê 4 heftiya berî civînê bi niviskî ji rêvebiriya sîwanê re were shandin. Ev ji civîna sazûmankarî re derbas nabe.

4. Her endamê endama xwedî mafe bi daxwaznameyê bandorê li ser bîrdoziya sîwanê bike. Daxwazname divê bi niviskî were dayin û bi kêmasî ji aliyê deh delega ve were îmzekirin. Wext jêre heye, ew di civîna delega de sebebê daxwaznama xwe shirove bike. Birêvebiriya civînê biryar dide ka shêwr wê li ser daxwaznamê were kirin an na. Ji derveyî vêjî mafê her endamê endamekî heye ji aliyê delegê sîwanê ve ji bo saziyek sîwanê re were hilbijartin, bi shertê endam êzidî be û temenê wî 18 sal be.
5. Dema gûman hebîn, bi erêkirina „Meclîsa rûhani“ li lalishê bi niviskî dikare were qebûl kirin.

6. Her mal an jî komela endam dikare di riya birêvebiriya xwe da daxwaznama pêskêshî komcivîna delega bike. Divê ev bi kêmasî 3 roja berî komcivînê bi niviskî an jî bi elektronikî bikeve dest. Daxwaznamê bi lez dikarin di komcivînê de jî werin pêshkêsh kirin. Komcivîna delega biryar di derheqê daxwaznama de dide.

7. Erkê endama ye pishtgiriya sîwanê bikin ta ew karibin armancên di destûrê de hatine kuvshkirin bi cih bînin. Ewe yekcar hemû agahiyan, derveyî mafê shexsa birîn bikin, pêskêshî sîwanê bikin.

8. Hemû endam girêdayî ne her sal 3 meha berî dawiya salê agahiyê nûjen yên endamê xwe, yên berê hatine diyar kirin ji nûve ji bo sîwanê diyar bikin. Di listê de bi kêmasî divê nav û navnishan werin diyar kirin.

9. Ji bo sîwan karîbe mesrefê xwe bide divê endam endametiya xwe a salê bidin. Komcivinîna delega biryar li ser jimara endametiyê dide. Endametî divê her sal di destpêka salê heya 01.01 werin razandin.

10. Mafên malên endam heye kû ew serbixwe kar û barê xwe li gorî destûra xwe bimeshînin. Divê kar û barê wan ne dijî biryarên komcivîna delega a sîwanê bin.

§ 5 Organê sîwanê

Organê sîwanê evin:
1. Komcivîna delega;
2. Civaka Shewrdarî;
3. Birêvebirî;
4. Komên kar û komên taybet;
5. Kardest;
6. Shewrdariya olî;
7. Cavdêrê kasê;
8. Koma hilbijartinê;
9. Koma sherefê.

1. Komcivîn delega

a) Komcivîna delega organa sîwanê a herî bilinde. Her salê carekê divê komcivîna delega bi rêk û pêk were li dar xistin.

b) Komcivînên delega yên taybet tên li dar xistin dema koma birêvebirî bi yek dengî bixwaze an jî koma shewrdarî bi 2 ji 3 denga bixwaze. Dema daxwazname ji aliyê delega ve bi kêmasî 1 ji 4 denga bi niviskî were dayin, koma birêvebir divê komcivîna delega a taybet di navbera 3 meha de li dar bixe.
c) Her delege xwediyê yek dengiye. Dema delegek ne karîbe tevlî komcivînê bibe, divê navê cîhgirê wî 10 roja berî civînê ji bo birêvebirîyê were diyar kirin. Delegên mala û komela divê ji bona destgirtina qertê deng nasnama xwe pêshkêshî birêvebiriya sîwanê bikin.
d) Birêvebirî ji bona komcivînê bi kêmasî 4 heftiya berî civînê vexwendina bi niviskî bi diyarkirina wext, cih û rojevê bi rê dike. Vexwendin bi niviskî an jî bi riya elektronikê tê shandin. Dema shandina vexwendiyê bi roja pishtî shandinê tê jimartin. Shandina vexwendinê ji bo endama qebûle dema ew li ser navnîshana dawî a ji aliyê siwanê ve tê zanin re were shandin. Daxwazname, lê zêdekirin an jî gûhartina rojevê divê bi kêmasî heftiyekê berî komcivîna delega ji birêvebiriyê re bi niviskî an jî elektroki were shandin. Ewê bi lez ji delega re werin shandin û wekî di wexte de were qebûl kirin û li rojevê were zêdekirin. Komcivîna delega daxwaznameyê bi lez li biryarê girê dide. Eger ev daxwazname ji aliyê piraniyê ve ne hate pejirandin, ewê têkeve lîsta rojeva pêsherojê.
e) Birêvebirî, yekcar serok anjî cîhgirekî wî komcivîna delega birêve dibe. Di hilbijartinê de komcivîn ji aliyê birêvebirekî ji aliyê birêvebiriyê ve hatiye pêshniyar kirin û ji aliyê komcivîna delega ve hatiye hilbijartin ve tê meshandin.
f) Komcivîneke bi rêk û pêk hatî bang kirin bi amadebûna 51 ji 100ê delega xwedî biryare. Ew biryara bi dana piraniya denga digre, eger kû di destûrê de tishtekî

din nehatibe destnîshankirin. Dema dengê erê û na wekhev bin, daxwazname red dibe. Dengdan bi niviskî pêk tê, dema 10 ji 100ê delegê amade vê bixwazin.

g) Gûhartina destûrê û biryara betal kirina sîwanê tenê bi erêkirina 90 ji 100ê dengê delegên amade dikare were girtin. Dema biryara betal kirina sîwanê were girtin, divê 90 ji 100ê delegên bi rêk û pêk amade bin.
h) Li ser komcivîna delega divê protokolek were nivîsandin û ji aliyê birêvebirê komcivînê û protokolnivîsê ve ewê hatiye destnîshankirin ve were îmze kirin. 10 ji 100ê delega dikarin ji xeyna vê girtina video anjî deng bixwazin. Protokol divê pir dereng 6 hefta pishtî komcivînê bi niviskî ji her endamî re were shandin.
i) Endamên din jî yên endama û mêvan dikarin bi vewxwendina niviskî a birêverbiriyê a wek biryar hatî standin wek shêwrdar tevlî komcivîna delega bibin.
j) Hemû delege divê êzîdî bin.
k) Delege di biryara xwe de ne girêdayî tû derî ne.
l) Her endamê sîwanê dikare yek delege bishîne komcivîna delega.
m) Komcivînên delega ji bo raya gishtî vekirîne, eger delege biryara komcivîna girti negirin.
n) Pishtî rapora birêvebiriyê a salê hate xwendin, axaftina vekirî dest pê dike.
o) Birêvebirî dikare ji xeyna delega, birêvebiriya mal û komelên endam û xizmetkarên esas yên sîwanê, yên mal û komelê endam jî vexwîne.
p) Pishtî 12 meh dereng ketina dayina endametiyê, mafên endametî radiwestin heya endametî bi tememî were dayin.
q) Dema komcivîna delega ne xwedî biryar be, birêvebirî bi erqe di navbera 8 heftiya de ji nû de banga komcivîna delega bishîne. Di komcivîna dûemîn de komcivîna delega xwedî biryare beyî jimara delegan bercav bike.
r) Komcivînên delega biryara li ser mijarê di destûrê de hatine destnîshankirin û yên ji aliyê birêvebiriyê de û yên ji aliyê komcivîna delega de hatine pêshkêsh kirin dide. Yekcar mesûle ji bo erqên li jêr birêzkirî:
    - Standina biryarên projên stratejîk;
    - Hilbijartin û azad kirina endamê birêvebiriyê, yên shêwrdariyê, yên komîsyona hilbijartinê, yên shêwrdariya olî û kasedarê maliyê;
    - Dema pêwisti pê hebe, standina biryarên li ser erê kirin û betal kirina endametiyê;
    - Standina biryarê planê maliyê;
    - Standina biryarên vegûhartina destûrê û betal kirina sîwanê;
    - Destgirtina rapora salê a birêvebiriyê, kasedarê maliyê û azad kirina wan;
    - Destnîshankirina shertên hesab kirina jimara endametiyê.
    - Standina hemû biryarên ji bona xebata siwanê pêwîstin.
    - Destnîshankirina charcoveya xebata birêvebiriyê.

2. Shêwrdarî

a) Her endamekî sîwanê bi kêmasî bi kursiyekî di shêwrdariya sîwanê de cih digre.
b) Hemû endame shêwdariyê divê êzîdî bin.
c) Endamê shêwrdariyê divê ne endamê birêvebiriya esas û nejî shixulkarê kardestiya sîwanê bin.
d) Ne pêwiste endamê shêwrdariye endame mal an jî komelekê bin. Lê pêwîste ew ji aliyê mal an jî komelekê ve werin pêshniyar kirin.
e) Shêwrdarî shêwrdariyê dike û biryara li ser stûn û stratejiyên sîwane yên bingehîn distîne û pishtgirtina birêvebiriyê di bikaranîna erqên xwe de dike.

Di pirsên olî de herdem pêwiste dîtinên shêwrdariya olî werin standin. Projake dest bi meshê kiriye dikare ji aliyê shêwrdariyê ve bi piraniya 2 ji 3a dengan were sekinandin. Ji derveyî ve kar û barê shêwrdariyê ewe kû, cavdêriya kar û barê birevebiriyê bike, yekcar lê miqatebe kû ew di nava carcova destûrê de bimîne û biryarên komcivîna delega pêk bîne.

f) Shêwrdarî ji nava endamê xwe yek serok û dû cîhgira hildibijêre.
g) Komcivînên shêwrdariyê bi kêmasî salê dû cara tevlî shêwra birêvebiriyê tên bikaranîn. Bi kêmasî 4 heftî berî komcivîna endam bi niviskî anjî elektronîk tên vexwendin, cih, wext û rojev tên destnîshankirin.
h) Dema serokê shêwrdariyê bixwaze, divê endamekî birêvebiriyê jî tevlî civînê bibe.
i) Karê endamê shêwrdariyê xizmeteke sherefê ye û bê pere ye. Bi pêshêshkirina daxwaznamê ji bona mesrefa, ewê ji kasa maliyê werin dayîn.
j) Dema xizmetê dû sale, hilbijartinek nû dibe.
k) Dema endamekî shêwrdariyê karê xwe terk bike, ew mal an jî komel a ew endam pêshniyar kiribû, dikare cîhgirekî wî endamî destnîshan bike.
l) Dema daxwaza vegûhartina destûrê hebe, divê di pêshîde ew bi shêwrdariyê re were shêwr kirin.
m) Shêwrdarî xwedî mafê destgirtina biryara ye, dema 50 ji 100î endama amade bin.
n) Komcivin ji aliyê serok ve, dema ew ne amade be, ji aliyê cîhgirê wî ve tê meshandin. Shêwrdarî bi piraniya denga biryara distîne. Dema dengê erê û na wekhevdû bin, ew wek ret dihesibe.
o) Li ser civînê protokol tê nivîsandin.
p) Shewrdarî dikare destûrekê ji bona kargeriya xwe destnîshan bike.

3. Birêvebirî

a) 13 endamê birêvebiriyê hene, pêwîste ji wana bi kêmasî 4 jin bin: serok, 2 cîhgirê serok, katib, berpirsê maliyê û 4 endam. Di b cîhkirina endamê birêvebiriyê de divê belavbûna ezîdiya a geografik li gorî welatê ew jê hatî (Tirkiye, Irak, Iran, Syrya, Transkaukasya) li ber cav were derbas kirin.
b) Piranî 2 kes ji mal / komeleke endamê sîwanê dikarin namzeta xwe ji bo birêvebiriyê deynin. Dema ji endamekî sîwanê dû kes werin pêshniyar kirin, divê yek ji wan jin be.
c) Endamê birêvebiriyê ji bona 2 sala di hilbijartinek girtî de tên hilbijartin. Ew kes wek hilbijarti tên qebûl kirin, ewê piraniya dengê qebûl standine. Destpêka karê birevebiriya nû bi girtina komcivîna delega dest pê dike, hilbijartinek nû a bi rêk û pêk di komcivîna delega tê cê kirin. Dema di hilbijartina de di cara pêshî de namzetvanek piraniya dengê hatî dayîn nestîne, divê hilbijartinek di navbera herdû kesên herî pir deng standine de were kirin. Hilbijartinek nû dibe. Dema ew kes cara dûemîn nehate hilbijartin, ew xwe ji karê xwe vedikishîne.
d) Destnishankirina namzetvana pishtî gotûbêjê pêktê. Dema jimara dengê girtî wekhev bin, biryar bi kishandina cîtikê tê standin.
e) Ew namzetvanên werin hilbijartin, divê ji bo wî karî re pêkhatî bin, yanî divê temenê wî bi kemasî 18sal bin, divê ew di derheqê wî karî de xwedî îsbat û tecrûbe be, divê sûcê wî nebîn, divê navê wî xwesh bê zanîn û divê ew ne endam anjî calakvanekî partiyek siyasî a welatekî der be.

f) Birêvebirî li gori § 26 BGB mesûltiya siwanê dike. Mesultiya sîwanê li cem dadgehê û li derveyî dadgehê ji aliye serok û herdû cîhgirê wî bi tevayî pêk te. Eger serok bê mical be, herdû cîhgirê wî bi tevayî mesûltiyê dikin. Eger cîhgirê yekem bê mical be, mesûletî tevlî serok û cîhgirê dûewem pêk tê. Dema serok û herdû cîhgir bê mical bin, mesûletî tevlî dû endamên din yên birêvebiriyê pêk tê.
g) Birêvebirî li ser karê xwe dimîne heya hilbijartinek nû pêk hat. Dema endamekî birêbiriyê berî wextê xwe dest ji karê xwe berde, shêwrdarî cîhgirê wî ji bo dema mayî destnîshan dike. Endamê birêvebiriya nû kar û barê endamê dest ji kar berdayî berdewam dike.
h) Birêvebirî berpirsyare ji bo pêkanîna kar û barê sîwanê. Kar û barê wî yekcar evin:
   - Vexwendin û meshandina komcivîna delega;
   - Meshandina sîwanê û pêkanîna biryarê komcivîna delega;
   - Bi cîhkirina kardestê sîwanê û cavdêriya wî;
   - Berdana kardestê sîwanê;
   - Standina biryara li ser daxwaznameyên ji bo endametiya sîwanê;
   - Standina biryarê betal kirina endametiya endamekî sîwanê;
   - Destnîshankirina destûreke kar û xebata birêvebiriyê bi rêk û pêk;
   - Destnîshankirina destûreke kar û xebata kardestê sîwanê bi rêk û pêk.
   - Birêvebirî tê hiqumdarkirin, vegûhartin û lê zedekirina destûrê pêk bîne dema ev ji aliyê dadgeha qeydê anjî dayra maliyê ve were xwestin, ji bona sîwan karîbe wek saziyeke xizmetkarê raya gishtî were qebûl kirin, ev gûhartin û lê zêdekirin divê armanca saziyê, pêwistiya piraniya jimara hilbijartina û pêshkêshkirina mîrata saziyê di dema betalkirinê de yên di komcivina delega de hatine destnîshankirin neyên gûhartin.
i) Birêvebirî di civîna de bi piraniya denga biryara distîne. Dema denge erê û na wekhev bin, daxwazname wek red kirî qebûle. Biryar dikarin bi niviskî, nivîsên rêdûr, an jî elektronik werin standin, dema hemû endam vê rê maqûl bibînin. Serok divê rewshê de temamkirina wê bi rêkxistin dike.
j) Tenê endamê mal û komelên sîwanê dikarin bibin endamê birêvebiriya sîwanê. Dema endamekî birêvebiriyê endametiya xwe ji mal / komela xwe betal bike, endametiya wî di birêvebiriya sîwanê de jî betal dibe.
k) Birêvebirî salê bi kêmasî 6 cara dicive. Dema 1 ji 3 endamê birêvebiriyê bixwaze, divê birêvebirî di navbera 2 heftiya de civînekê li darxe.
l) Birêvebirî xwedî biryare, dema bi kêmasî nîvê endamê birêvebiriyê amade bin. Biryar bi piraniya denga tên standin.
m) Endamê birêvebiriyê karê xwe wek xizmeta sherefê dimeshînin û mafê wan nîne ji bo karê xwe heq bistînin. Mesrefê kar dikarin ji maliya sîwanê werin xwestin û standin.
n) Serok civînê birêvebiriyê û grupen kar dimeshîne. Dema ew bê mical be, endamekî birêvebiriyê anjî serokekî grupên kar civîne dimeshîne.
o) Deynê sîwanê tenê ji maliya sîwanê tên dayîn. Endamê sîwanê nakevin bin deyn. Tewankirina li gorî riya qanûnî, yekcar ji bo karên ne di rê de, yên bê hemd û yên bi qest li cihê xwe dimînin.
p) Hemû endamê birêvebiriyê divê êzîdi bin.
q) Endame birêvebiriya sîwanê nekarin li gorî §3 reqem 7 a vê destûrê edamê sîwanek din a rêkxistina êzidiya bin.

4. Grûpên kar û komîsyon

a) Komcivîna delega dikare dema pêwistî pê hebe biryar ji bo cêkirina grûpên kar û komîsyona ji bona salekê bide. Di van grûpên kar û komîsyona de kesên ne êzîdî jî dikarin cîh bigrin.
b) Grûpen kar pishtgiriyê û shêwrdariyê ji bo birêvebiriyê dikin. Biryarê wan birêvebiriyê girê nadin.
c) Mafên wan heye di komcivîna delega de daxwaznama pêshkêsh bikin û sedemên xwe shirove bikin.
d) Birêvebiriya sîwanê bixwe jî dikare ji bo demek qut (3 heya 6 meha) grûpên kar ji bo karên taybetî cê bike.
e) Hemû grûpen kar deyndarin li ser karê xwe raporê bidine birêvebiriye, dema ew were xwestin.

4. Kardestî

a) Birêvebirî kardestekî destnîshan dike. Ew giradayî emrê / talîmata birêvebiriyê ye û karê sîwanê yên rojanê dimeshîne.
b) Maf û erqê kardest ji aliyê birêvebiriyê ve tê destnîshankirin.
c) Ew ji bo karê xwe heq distîne. Komcivîna delega jimara miashê wî li gorî karê wî li biryar girê dide.
d) Kardest cihê kar (office) dimeshîne.

6. Shêwrdariya olî

a) Komcivîna delega shêwrdariya olî ji bo dema 2 sala hildibijêre. Jimara wan heya 5 kesa ye û ew di pirsên olî de shêwrdariyê ji bo birêvebiriyê, shêwrdariya sîwanê, grûpen kar û komîsyona dikin. Hemû endamê shêwrdariya olî divê êzîdî bin.
b) Kar û barê shêwrdariya olî evin:
   - Nerxandina oldarî a naveroka kursên olî ji bona dersên ola ezdayetiyê.
   - Amadekirina shertên pêkhatina mamosteya û pirtûka ji bo dersên ola êzî;
   - Destnîshankirina dema rojîya û cejnên êzîdiya;
   - Avakirin û îdare kirina akademiya dersên ilmê êzdayetîyê.

7. Cavderê maliyê

a) Komcivîna delega bi piraniya denga ji bo dema 2 sala 2 cavderê maliyê hildibijêre.
b) Cavdêrê maliyê divê ne endamê birêvebiriyê bin.
c) Cavdêrên maliye mesûlin ji bo amadekirina rapora maliyê. Divê ew hesabê maliyê, meqbûz, pelîkê kontoya û rêk û pêka nivisandina deftera hesaba û kasê li ber cav derbas bikin, ka mesûlê maliyê karê xwe bi rêk û pêk dike.
d) Cavderên maliyê dikarin tenê nerazîbûna xwe li ser shiklê nivisandina defter û kasa maliyê ji aliyê mesulê malê ve bînin ziman, lê ne li ser armancên mesrefên ji aliyê birevebiriyê ve hatine biryar dayin.
e) Ew ji bo komcivîna delega azad kirin an jî ne azad kirina mesûlê maliyê pêshniyar dikin.

8. Komisyona hilbijartinê

a) Ji bona pêkanîna hilbijartina komîsyonek ji 4 kesa, serkarekî hilbijartinê, cîhgirê wî, û 2 alîkar pê divê.
b) Endamê komîsyona hilbijartinê bi piraniya denga tên destnîshankirin.
c) Komîsyona hilbijartinê berî hilbijartinê li ber cav derbas dike, ka namzetvan shertên bijartinê pêk tînin, di dema hilbijartinê de cavderîyê dike ji bo hilbijartin bi rêk û pêk bimeshe û pishtî hilbijartinê dengê hatî dayîn dijmêre. Di dawiyê de serkarê komîsyonê encamê hilbijartinê eshkere dike.

9. Shêwrdariya sherefê

a) Ji bo careserkirina nexweshiya di navbera sazî û endamê sîwanê û di navbera endamê sîwanê bixwe de komcivîna delega li ser pêshniyara birêvebiriyê shêwrdariya sherefê ji bo dema 2 sala destnîshan dike.
b) Ew ji heya 5 kesa pêk tê, divê hemî êzîdî bin.
c) Ew li gorî destûra xwe a shewrdariya sherefê lihevanînê pêk tîne. Destûra shêwrdariya sherêfe ji aliyê birevebiriyê ve tê destnîshankirin û ji aliyê shêwrdariya sîwanê ve tê qebûl kirin. Pêshniyara shêwrdara aliya girê nade.
d) Endamên sherefê dikarin di heman wextî de endamê birêvebiriyên bin jî.

§ 6 Hatin û mesrefê sîwanê

Hatinên sîwanê yên bingehîn evin:
a) Endametiya Endama; komcivîna delega jimara endametyê destnîshan dike;
b) Xêr, yên bi tû sherta ve ne girêdayî, yên ne dijî armancên sîwanê bin û astengiya li xebata sîwanê nekin;
c) Perên pêshvebirinê, yên enstitût û wakfên raya gishtî;
d) Hatinên ji firotina zayindeyên ji bo reqlamê;
e) Hatinên ji firotina rojnameyan, kovara, pirtûk û medyayên din;
f) Hatinên ji cejnên sîwanê û calakiyên din.

§ 7 Betal kirina sîwanê

1. Dema sîwan were betal kirin an jî mafê armancên pacxistinê wenda bike, malê sîwanê ji saziyekê raya gishtî re an jî ji saziyek din re a xwedî mafê pacxistinê re dimîne
   - a xwedî armancên pishtigiriya karê lêkolin û lêgerinê be.
   an jî
   - xwedî armanca pishtgiriya lêkolîn, lêgerîn, chand û ola ezdayetiyê be.

2. Tenê komcivîna delega dikare di komcîveke bi armancê betal kirina sîwanê de biryara betal kirinê bistîne.
3. Biryara betal kirinê divê bi piraniya denga 9 ji 10an were standin.
4. Erqê sîwanê ye xwe betal bike, dema jimara endamê wê yên aktiv bin 3ya bikeve. Tê wê wateyê kû jimara mal û komelên aktiv di birêvebiriyê de bin 3ya bikevin yên mesûlê xwe bishînin komcivîna delega.
5. Dema biryara betal kirina sîwanê hat standin, serok tevlî cîhgirê xwe karê betal kirinê dimeshînin, eger komcivîna delega kesekî din bi vî karî nedabe wesife kirin.

6. Maf û erkê betalkara di destûra betal karina komela de li gorî BGB hatiye destnîshan kirin.

§ 8 Destnîshana dawî

1. Dema di vê destûrê de destnîshanên din nehatibin standin, destnîshanên qanûni dimeshîn.
2. Dema di vê destûrê de wezife hatibin bi nav kirin, ew ji jin û mera re wekhev derbas dibin.

§ 9 Bihêzgirtina destûrê

Ev destûr, a bi vî shiklê amade ye, di komcivîna delega de a di 29.01.2017a de bi yekdengî qebûl buye. Destûr bi qeydkirina li qeyda komela hêz digre.

Bielefeld, 29.01.2017

Endamên sazûmankar: ...